Politik ART

KOVARA WÊJE HUNER Û RAMANÎ YA 15 ROJÎ

24 Mijdar 2018 Şemî

HEJMAR: 253



WÊNE: FEWZÎ BÎLGE

# Şêwekariya Kurdan

www.arsivakurd.org

Çîrok

Behr dike xuşîn,
Ça mêşe hêşîn,
Û ez dixwezim, wekî ew hêja
Minra çîrokê xweye kevn bêje,
Ji wan çîrokê derheqa behra,
Ku dya me carna gotîye mera.
Dewsa çîroka behr fesal, hêsa
Tê û lingê min qemer dalêse,
Û ez hew zanim,
Ku dîsa zarim,
Dayka min dîsa lingê min dişo,
Û ser nivîna wê demê pişo
Xwera razaye, xewna dibîne.
Derva êvare,
Û êvar bîna hêjîrê tîne.

Mîkaêlê Reşîd
1964


FOTO: VISOOT UTHAIRAM/WİETNAM



FOTO: LEO LIBIN

Li Çînê zarok li kûçeyekê bi heyr û metel li dikanekê mêze dikin

Herausgeber: *Medya Presse-und Werbeagentur GmbH* Hans-Böckler-Str. 16 63263 Neu-Isenburg **Geschäftsführer:** Ahmet Yücedağ **Ver. Redakteur:** Özgür Reçberlik **politikart@yeniozgurpolitika.org**

www.arsivakurd.org

# Reng ji bo min gerdûnî ye

◗ Ez hez ji karê vîdeo nakim. Ez hez jê nakim, ew jî şêwazên hunerî ne. Înstalasyon in, performans in, karê vîdeo û postmodern û nizanim çi ye. Ji bo min resm dest û hest in.


Luqman GULDIVÊ

Şêrko Celal di nava 15 salan de ji bo kanalên televizyonên Kurdî, Medya TV, Roj TV, Stêrk TV´yê qederê 350 bernameyên li ser şêwekariyê û li ser şêwekarên Kurd çêkirine. Ew bi xwe jî yek ji hunermendên "jêhatî ye" û ji bo mêvanên bernameya xwe jî dibêje, bi pirranî, ji wan hunermandên bi kalîteya xwe baş in û peyva "top" ji bo wan bi kar tîne. Şêrko Celal, bi îhtîmam îşaret pê dike ku jêhatîbûna hunerî û behremendiya hunermend bi xwe di mijara peydebûna hunermendên cihanî de diyarker nîne û bi ya wî dezgeh û saziyên dewletî geek caran ji bo peydekirina hunermendên bi vî rengî pêwîst e. Em bi Şêrko Celal re li ser hunerê wî û bernameyên wê yên li ser şêwekar û şêwekariyê peyivîn.

***Karê hunerê li cem te kengî dest pê kir, te kengî bi rastî dest bi şêwekariyê kir?***

Birayê min Rehber, muzîkjen bû, awaz jî datanî, hunermendekî mezin bû. Ew û Ebdula Peşêw ji zaroktiyê ve heval bûn. Paşê her du li Rûsya bi hev re bûn. Rehber akademî xwend. Wê gelekî alîkariya hevalan jî kir, ya PKK´ê. Ew birayê min ê mezin bû. Wî ji min re got, tu wê bibî resamekî gelekî mezin. Ji ber ku tesîra wî li ser min gelek bû, ji xwe piştî ku dît ez ji rengan û xêzan hez dikim, gelekî alîkarî bi min re kir. Ew beriya min bi sê çar salan çûbû Bexdayê li Peymangeha Hunerê Bedew bixwîne. Gava min jî lîse qedand, wî ez mecbûr kirim ku li Peymangeha Hunerê Bedew bixwînim. Axir destpêkirina min a rahiştina hunerê resman û şêwekariyê her bi karîgeriya birayê min Rehber bû.

Xwendina li peymangehê 5 salan kişand. 3 sal bi giştî bû, ji seramîkê heta bi rengan, mirov bi her tiştî dadiket. Piştî sala sêyem, kîjan dersa te baş bû, lazim bû mirov îxtîsasa xwe bike. Ya min di beşa reng û xêzkirina bi qelemê de bû. Ev pênc sal her bi karê akademîk rabûm. Mamosteyên akademiyê ji karê min ê realîst gelekî razî bûn.

Jixwe di îmtîhana qebûlkirina 60 kesan ji bo îxtîsasê di nava 3 hezar kesan de ez bûm kesê sêyem. Mamosteyên me ji me re gotin, hûn dibine hunermend, jiyana xwe hemûyî hûnê huner bikin. Axir ev pêşbîniya wan rast bû, lewma gelek kesan peymangeha hunerên bedew diqedand, lê dev ji huner û resmê berdida. Min dev ji resmê berneda.

Jixwe paşê, min wiha hest pê kir, heger hunermendek hinekî xwende be, xwe karibe perwerde bike, karibe rexneya hunerî bike, divê karibe di nava çapemeniya Kurd jî ji xwe re cihekî ava bike. Ev bernameya li ser resmê li Roj TV dest pê kir. Lê beriya wê min sê salan di bernameya Roj baş Kurdistan de jî kar kir û beriya wê li ser dîroka muzaxaneya Louvreê min bername çêkirin.

Ji sala 1991´ê heta sala 1995´an min li ser Louvreê lêkolîn kirin û min lêkolînên xwe wergerandin Soranî. Min dixwest wê bikim pirtûk. Lewma ji bo min dîroka muzexaneya Louvreê ne tenê dîroka resm û resaman bû, ew dîroka Fransa û hunerê rojavayî bû û bi ya min girîng bû.

Axir gava çûm televizyonê, li wir ji min re gotin, mamoste, ji bo çi tu wê bi tablo û vîdeoyan nakî bername? Ji ber wê jî min ew kir bernameyeke ji 24 xelekên 25 deqîqeyî. Sala 2000 ta 2001´ê li Medya TV bû.

Axir piştî ku sê salan min di bernameya Roj baş Kurdistan de jî kar kir, di ROJ TV de min dest bi bernameya "Tijkî Huner" kir, heta ku ROJ TV hat girtin. Ev pênc sal in bi navê "Rêjneyî reng" di Stêrk TV de bernameya bi hunermendên Kurd re çêdikim.

**Şêwazê te yê hunerî çi ye, wek stîl û rêbaz?**

Karê min bi pirranî abstrakteke fîguratîf e, lê hindek caran abstrakteke kamil a bê fîgur e, tenê reng in. Di destpêkê de min gelekî hez ji terzê realîzmê dikir. Ev deh sal in, ez bêhtir abstrakt kar bikim jî hin caran vedigerim ser şêwazê realîzmê. Realîzma min jî bêhtir ber bi împresyonîzmê ve diçe. Tu rastiyê bivê, ji ber pêdiviyên madî, ji ber ku gelek xelkê Fransî hez dikin, ez karê împresyonîst jî dikim, pirranî derya, ketî û filan in.

Ez hez ji karê vîdeo nakim. Ez hez jê nakim, ew jî şêwazên hunerî ne. Înstalasyon in, performas in, karê vîdeo û postmodern û nizanim çi ye. Ji bo min resm dest û hest in. Pêşî beriya ku tu dest biavêjî rengan, mejî dil hişyar dike, dil hestan û paşê jî çav gelekî muhim e. Axir ev meseleya kompûter û van tiştên hanê, aqlê min ji wan nabirre. Ev fikra min e.

Ne ku tiştekî şaş e. Felsefeya huner heye, yên ku di bawara teknolojî û rêbazên nû dinivîsin hene, dibêjin, hunerê resmê jî bi teknoljiyê re bimeşe. Lê ji bo min, resm û tablo, mesele kevaleke di nava çarçoveyekê de ku reng li ser in û bi dîwarekî ve hatiye hilawistin. Lê înstalasyon, gelo tu dikarî bikirrî, bînî mala xwe deynî? Nexêr. Ev jî bo min karên demkî ne. Ji bo înstelasyonekê carinan tu holeke dêwane bi kar tînî û materyalekî zêde. Piştî hefeteyê yan jî mudeteke diyar hemû ji hev tê xistin. Axir ji bo min, hunerê şêwekariyê reng e.

***Li ser reng tu çi difikir?***

Beriya vê, ez dixwazim îşaret bi minaqeşeyeke di nava Kurdan de a li ser reng bikim. Divê em li ser mutabiq bin ku reng gerdûnî ne. Kesk li Kurdistanê jî û li Emerîka jî her kesk e. Zer jî wisa, bi payîzî re belg û giya li Hindistanê jî, li Kurdistanê jî, li Fransayê jî her zer dibin. Reng ji bo min gerdûnî ye. Ango rengekî Kurdî nîne, yan jî "rengê Kurdî germ e" ne gotineke di cih de ye. Ma reng li Kurdistanê ji Efxanistanê germtir in, yanî çi?

Herçî hunerê şêwekariyê ye li Kurdistanê em bibêjin bila rabihuriyeke wê ya 70 salan hebe. Zêdetir li Başûrê Kurdistanê, li Silêmanî, Hewlêr çend resam peyde bûn. Yek ji wan Daniel Qesab bû, bi xwe Cihû bû, Felah Hesen heye li Silêmanî. Wan li ser dîwarên qehwexaneyan resm çêkirine, resmê xwazayê. Karê wan ê esasî xweşnivîsî yanî xetatî bû. Li Kurdistanê îro jî adet e, kesek dikanekê vedike, van resaman menzereyeke Kurdistanê li ser dikanan datanî û bi xweşnivîsî jî navê wan datanî.

***Reng kengî hatiye Başûrê Kurdistanê?***

Ango reng beriya bi 70 salan hatiye Kurdistanê, helbet ev reng li Kurdistanê nehatine çêkirin. Reng ji Bexdayê û ji Ewrûpa dihatin û li Kurdistanê jî dihatin firotin. Wan kesan ji bo awayekî gelekî sade dest bi karê rengan kiriye û gelekî amator bûn.

Salên 50´î dîroka şêwekariyê ji bo Başûr jî li Bexdayê dest pê kiriye. Bla heta salên 45´an jî biçe. Ji Iraqê xwendekarên Ereb ku li Fransa xwendin û vegeriyan, li Bexdayê peymangeh avakirin. Dîroka şêwekariya Kurdistanê jî ha li wir vedigere. Jixwe ji ber vê yekê jî li gorî beşên din ên Kurdistanê şêwekarî li Başûr û Rojavayê Kurdistanê piçekî pêşketîtir e. Dîroka şêwekariya Rojava jî dişibe vê û teqrîben di heman demê de ye. Ji ber wê jî hunermendên me yên zor baş hene li wir, yên weke Malva hunermendekî zor gewre bû, rehmet kir, wekî din Ziwêr Hesîb û Behrem Haco hene. Ew jî vedigere dîroka akademiya Şam û Helebê wan.

Li Bakur û Rojhilat bi karê di asta akademiyan de nû nû radibin; va ye li Amedê hene, ew jî bi pirranî amator in. Rast e li nav Tirkan hinek hene, lê ew di wê astê de ne, heta ku nabêjin ew Kurd in jî. Ew li Stenbol, Enqere û bajarên Tirkiyeyê mezin bûne û muhtemel e ku bi Kurdî jî nizanibin. Min bi xwe ji bo bernemeyê nav peyde kirin, lê wan qebûl nekir ku ez bernameyê bi wan re çêkim. Li Rojhilat, nexasim li Mehabad û Sine rewş li gorî Bakur hinekî baştir e. Van 15 salên bihurî hem resam û hem peykertiraşên baş peyde bûne li wir.



Ez wekî din elaqedarî pirsê bibêjim, hunerê Kurdî nîne. Hunerê ku hunermendekî Kurd çêkirî hene. Gava ku wî şivan, pez, kon, awayê jiyana rêûresma Kurdistanê resm kiribe, hingê wî motîfên Kurdî bi kar anîne. Lê ew ne hunerê Kurdî ye, ew kelepûra Kurdî ye.

Mesela resmeke min a abstrakt, heger navê min li bin nebe, kes nizane ka hunermendê çêkirî ji kîjan miletî ye. Belkî Fransiyekî çêkiribe, belkî jî Emerîkiyekî. Abstrakta mutleq jixwe tenê reng e, yan bi kontrast yanî sar û germ weke zerek li gel şînekî, yan jî bi harmonî û aheng kar hatiye kirin.

***Tu kîjan rengan tercîh dikî, yan jî hîç rengên tu tercîh dikî hene?***

Meyla min a ji bo rengekî nîne, ez bi giştî hez ji rengan dikim û hemû rengan jî bi kar dîinim. Lê helbet, heger ez deryayê xêz bikim, reng diyar in. Rengê deryayê, yê plajê ew xweza diyar e. Ez bibêjim gava tu zivistanê xêz bikî, ezman gewr e, risasî ye, ewrê spî lê hene, dibe ku berf hebe. Ango meyla rengan na, lê tercîh bi tişta ez xêz dikim diyar dibe, bihar be mesela reng bêhtir kesk e, şîn e û rengên biharê ne. Naverok jî diyarker e. Heger şîneke be, nabe ku rengên şahiyê bi kar bînim. Zer, narincî, sorê zelal ên şahiyê ye; lê rengên şînê tarî û rengên tije û tarî jî weke rengên xembar tên dîtin. Jixwe bi Fransî gava çêl li van rengan bê kirin dibêjin, rengên xembar. Gava tu tabloyekê li ser Helebce çêkî divê tu wan rengan bi kar bînî ku rengên xemê ne, yan jî xemê tabîr dikin.

***Di encama 350 bernameyan de tu asta hunerê Kurdî çawa dinirxînî?***

Gelek hunermendên me hene, ku hunerê wan di asta hunerê bilind ên dinyayê de ye û heta belkî ji wan jî baştir in. Lê belê, ji ber ku em ne xwedî dewlet in, dam û dezgehên mezin li pişta wan hunermendan nîne ku reklama wan bike da ku bibin hunermendên cihanî, hunermendên me yên Kurd ên cihanî nînin.

Li vir a ku ez dibêjim bila şaş neyê fêmkirin. Gelek hunermendên me hene ku di asta hunermendên cihanî de ne û heta yên karê xwe baştir jî dikin hene.

Di sînemayê de jî wisa ye, hunemendên me yên mezin hene, Yilmaz Guneyê me hebû, Behman Qûbadiyê me heye, lê wek hunermendekî cihanî biya min em nikarin wan bi nav bikin.

Mesela weke şair, Ebdula Peşêw, ez niha derkevim kolanên Lilleê bipirsim ka Ebdula Peşêw kî ye, kes wê nizanibe, kî ye, heta belkî li bajarê jê ye jî gelek kes wî nas nekin, ji ber ku ev 25 sal in li Helsînkî ye. Ne ku hunerê wî yê şiirê ne baş e, lê nayê nasîn.

Nebûna dam dezgehên mezin, yan jî dewletî ji bo hunermendên Kurd pirsgirêkeke mezin e; lewma kesên ku bazirganiyê jî bi berhemên hunerî dikin, gava bên li tabloyeke min binihêrin, bibêjin, ez ê 2 hezar euro bidim, ez dizanim, ew ê bi 20 hezaran bifiroşe, lê ji ber ku ew dam û dezgehên lazim ji bo me nînin, rewş ji ev e.



www.arsivakurd.org



# Şêrko Celal huner û televizyon

**Şêrko Celal ji bo mêvanên bernameya xwe ku niha di Stêrk TV (Rêjney Reng) de tê weşandin û yên bernameya xwe ku ku berê di ROJ TV (Tijîkî Huner) de dihat weşandin, dibêje, ew ehlê hunerê xwe bûn, dîplomayên wan ên mastir, doktora yan heye, yan jî xwedî tecrûbeyeke qebûlkirîne ji 30-40 salan û vir ve. Wekî din bernamevan divê alîkar be bi hunermendên ciwan re jî. Şêrko Celal pê serbilind e ku bi hunermendên Kurmancî, Soranî û Kirmanckîaxêv re bername çêkiriye.**

**Şêrko Zelal bi xwe 14 salî resmê nas dike. Ew sala 1981´ê ji Kurdistanê derdikeve û gava diçe Fransa 21 salî ye. Ew bi lez dikeve nava civaka Fransî ya li paytextê. Îro jî ew hem bi karê hunerê radibe û hem jî bernameçêker e. Li bajarê bakurê Fransayê Lilleê dijî.**

Divê em li ser mutabiq bin ku reng gerdûnî ne. Kesk li Kurdistanê jî û li Emerîka jî her kesk e. Zer jî wisa, bi payîzî re belg û giya li Hindistanê jî, li Kurdistanê jî, li Fransayê jî her zer dibin. Reng ji bo min gerdûnî ye.



Reng beriya bi 70 salan hatiye Kurdistanê, helbet ev reng li Kurdistanê nehatine çêkirin. Reng ji Bexdayê û ji Ewrûpa dihatin û li Kurdistanê jî dihatin firotin.








# 'Yanî bûye Elman ha'





Hunermendeke jin a ji Silêmaniyê, li Elmanyayê dima, li Stuttgartê, ez naxwazim navê wê bibêjim. Hunermendeke amator e. Lê ji bo ku jin jî di ekranê bêhtir xuya bikin, em tercîh dikin cih bidin jinan. Axir ji bo bernameyekê gava ez li Mannheimê bûm, bi rêya telefoneke ji hunermendî re wê hunermendê xwest ku Şêrko Celal bi wê re jî bernameyê çêke. Min jî got, temam bila telefonî min bike. Paşê min telefonî wê kir û min got, em bên bernameyê çêkin. Hîna nû 5-6 sal bûn ku ew ji Kurdistanê derketibû. Ez bi xwe sala 1981´ê ji Kurdistanê derketim. Axir, bi erebeyê piştî rêwîtiyeke 6-7 saetan, em nêzîkî bajêr aliqîn, rê asê bûn. Min gotibû em ê saet çaran bigihin. Saet 4 û nîv axir, kameramanê me Cemal, got mamoste telefonî hunermendê bike û bibêje em ketine nava îzdîhama seyareyan, da zanibe em ê dereng bigihîjin. Min telefon kir, ranehiştiyê, paşê dîsa min hewl da, mêrekî rahiştiyê, got, ez hevjînê wê hunermendê me. Min got, ma filan kes li mal e got, na. Min got, çima, ez ji ROJ TV têm ji bo bernameyê, civanê min hebû ligel wê?

Qaşo weke Ewrûpiyan dike, lê Ewrûpî teqdîra rêya dûr, qeza û îzdîhamê dikin; lê hevjînê wê got, ew roportaja te qebûl nake, ji ber ku tu dereng maye. El esas, yanî bûye Elman ha.

Samî Dawid ji Rojava ye û li Başûr jî baş tê nasîn, wî hîna duhî ji min re got, kesek nemaye li Silêmanî ku bi vê meselê nizanibe.

Axir ji bo min dîsa xêr bû. Me telefonî Behrem Haco, Mîrê Hêkan û bi giştî min wê rojê hevpeyvîn bi 5 hunermendan re eyar kir û me bername çêkirin.



www.arsivakurd.org

# Rêçên wêjeya devkî di hunerê şêwekariya Kurdan de

◗ Îro roj, huner êdî têkiliya xwe bi temamî ji xwezayê birriye. Ji ber vê yekê jî di nav îndustriyeke çandî de dirûvekî xwejinûveavakirinê li xwe zêde kiriye û her xwe ji wan nirxan dişo ku bi têgehên xweza û rastiyê re têkildar in.

**Ali Rıza KILINÇ**


Carinan mîna xêzekê, carinan weke deng, têhn û carinan jî bi reng û dirûvên xwe yên cihê, mîna dîmen cihê xwe di jiyana me de girt. Hunerê bi rengê xwe, melodiya xwe ya efsûnî her weke berhemeke mirovî cihê xwe di nav rûpelên dîrokê de girt. Eynî mîna qulingên xwe li ber bayê demsalan berdidin, geh li gor wext, cih û geh jî li gor pêwistiya xwe weke gotineke cihê, hebûn û nasnameya xwe çêkir; di her çaxî de wê ziman û qaîdeyên xwe ava kirin.

Bi vê pêkhatinê re nirxê estetîk û ragihîner ê berhema hunerî jî guherî û diguhere. Mirov nikare behsa hunerekî bike ku li her wext û cihî tê, ji ber ku nirxekî negu-hêrbar û unîversal tine. Li gorî guherînên civakî û bi gerîna çerxa zemên re di huner de estetîk dikare carinan rastiyê temsîl bike. Carinan di îfadekirina hestên mirovan de dikare, bi rolekê rabe. Carinan jî şahidiya van herduyan dike. Ji ber ku rewş û rabûna mirovî ya li hemberî xwezayê her diguhere, gava mirov xwezayê diguherîne, bîra xwe jî ango jiyana xwe ya çandî jî hildiberîne. Îro roj ku êdî sînor bêwate bûne, huner xwe li ti rêgez û qalikên hişk nagire. Bi berhemeke îndustriyel re têkilîdanîn ango veguherîna hunerî bixwe weke berhemeke îndustriyel hunerî bi tehlukeya windakirina nirxê xwe re rû bi rû dihêle. Îro roj, huner êdî têkiliya xwe bi temamî ji xwezayê birriye. Ji ber vê yekê jî di nav îndustriyeke çandî de dirûvekî xwejinûveavakirinê li xwe zêde kiriye û her xwe ji wan nirxan dişo ku bi têgehên xweza û rastiyê re têkildar in. Weke encameke vê rewşê, her weke di hemû cûreyên hunerî de, berhemên hunerî yên şêwekariyê bi hêmayên dîtbarî yên cihê yên di nav çaxê zanyariyê de, di rewşeke kompleks a wateyê de ne. Hunerê şêwekariyê yek ji alavên sereke yên derbirîna mirovan e. Têgeha nirxa estetîk ku ji roja roj ve ji aliyê gelek zanyaran ve hewla binavkirina wê hatiye dayîn û bi wesfa xweşik re navê wê hatiye hildan, her ku diçe wisa lê tê ku wesfên cihê bihewîne. Lênihêrînên nû û şêweyên hunerî yên nû, bi guherîna dinya û mirovî re derdikevin holê.


Tabloyeke Zoro Mettînî

### Gewde wêjeya devkî ye

Vê guherînê di hunerê şêwekariya Kurd de jî xwe bi awayên paralel nîşan da. Hunerê wênesaziya Kurd ê qedîm bi naverok û dirûv bêhtir bi gotinê ango bi wêjeya devkî tê vegotin. Lewma jî wê di nava xwe de dinyaya xwe ya hêmayan ava kir. Heke em bibêjin, çavkaniyên bingehîn ên wêjeya devkî ya Kurd dengbêjan bi kilamên xwe di heman demê de hunerê şêwekariya Kurd bi gewde kiriye, ev ê ne mubalexe be. Di xweîfadekirinên kevin û çîrokan de gelek fîgurên mîtolojîk, xwe spartin hukmê nirxê estetîk ê ji rêûresmê yanî bêhtir xwe spartin têkiliya xweza û mirovî. Bivênevê, weke gerdûn, xweda, heqîqet, xwezî, exlaq, bawerî, qencî, xerabî, wêrekî, egîdiyê têgehên çandinî ku çi rasterast çi nerasterast tevlî jiyanê dibin, bi derbirînên dengbêjan re bi formên estetîk û têgehî yên cihê ji peyvê herikîn resmê. Lê ji ber ku hîna li ser têkiliya çanda devkî bi hunerê şêwekariyê re xebatên akademîk nehatine kirin, li ser mijarê nirxandineke berfireh bi sînor e. Lê dîsa jî pêkan e ku mirov di berhemên şêwekarên Kurd ên navdar de, li rastî rêçên çanda devkî were. Serkêşiya wan jî Ahmet Guneştekin ê li Batmanê xwedêdayî ye. Ew di nav wan şêwekarên Tirkiyeyî yên hin sax de ye ku berhemên wan bi buhayekî giran tên firotin. Resmên wî xwe dispêrin tradisyonên "dengbêjî" û "çîrokbêjî" yên çanda Kurd ku ew bi wan mezin bûye. Guh û dinyaya wî ya xeyalî bi çîrokên şevên dirêj ên zivistanê dem dane. Wî ew hemû hûrgiliyên li ser wan berik û merşên wan malên ji kerpîçê ku li wê erdnîgariya lê ji dayîkbûyî hene, xemilandî bi rengekî ku weke dayikek ji dûr ve bang li zaroka xwe bike, yek bi yek li ser resmên xwe neqişandin û bi dinyaya xwe ya xeyalî careke din ew hilberandin. Guneştekin piştî gelek salan ew hûrgilî bi parzûnka resma modern palandin û ew veguherandin hunerekî gerdunî. Pêşangeha li New Yorkê ya li yek ji navdartirîn galeriyên dinyayê Malboroughê vekirî, hîna di bîra her kesî de ye. Hemû berhemên wî di nava du saetan de hatin firotin. Şîrovekarê hunerê yê navdar ê Elman Johannes Odenthal wiha resma Guneştekin bi nav kiribû: "Resma Ahmet Guneştekin menîfestoya tradîsyoneke wiha ye ku di nav sînorên neteweyî, aliyên olî û berjewendiyên siyasî de hatiye parçeparçekirin."


ZORO METTÎNÎ

Temayên sereke yên resmên Zoro Mettînî vebêjeyên wêjeya devkî û tradîsyonel in. Ew ji derfetên hunerê resma modern sûdê werdigire û mijarên wekî azadiya jinê tinetî, rastgobûn, bawerî û çînên civakî bi şêweya xwe diresimîne.



ZORO METTÎNÎ



*Tabloyeke Zehra Dogan*

**Xêzkirina mîtolojiyê**

Hunermendekî din ê ji hunera devkî ango ji hîkayetên dengbêjan sûd werdigire jî Fewzî Bilge ye. Ew jî li Batmanê ye. Resm û xêzên ew li ser tuwalê datîne, bi peyvê re têkiliyeke berbiçavtir pêk anîne. Ew çîn û neqşên xwe dispêre lehengên efsaneyên wêjeya klasîk a Kurd. Xêzên wî berbiçavtir in û bi xwezayê re rasterast têkildar in. Ew hewl dide bi rengên tarî mekanên dîrokî, kes û fîguran bigihîne cihekî çîrokane. Her çendî xêzên wî tîr û qalind bin jî bi jin, pîr û kal, û portreyên zarokan îşaret bi wê heqîqeta hevpar dike ku pirrekê di navbera raborî û roja îro de ava dike.

**Perspektîfeke rexnegir li hunerê modern**

Naveke din a di hunerên şêwekarî de xwe dispêre wêjeya devkî ya Kurd jî rojnamevan û şêwekar Zehra Dogan e. Bi hinceta ku resmên di çaxê êrişên bi ser xwerêveberiyan de li navçeya Mêrdînê Nisêbînê xêzkirî, li ser medyaya civakî parve kiribûn û ji nivîsên zarokekî 10 salî nûçe çêkiribû, 2 sal, 9 meh û 22 roj cezayê hepsê lê hatibû birrîn. Mijarên ku ew xêz dike, guncaw in. Bi malzeme û şêweyên cihê li hunerê hevçax û estetîka wêneyê rexne digire û perspektîveke rexnegir derdixe pêş. Di serî de bi mijarên bi temaya jinê neqişandî, bi mijarên bi jiyanê re têkildar, dide pey pirsên lêgerîna heqîqeta hunerê gerdûnî û hunerê Kurdan û bi awayekî taybet bersivan dide. Di hedefa rexneyên wê de tenê desthilatdarî nîne lê hedefên rexneyên wê yên sereke hişmendiya mêrana ya li nav civakê pirr belavbûyî jî dihewîne. Gava ew şideta li dijî jinê û li dijî vê piştevaniya bi jinê re ji xwe re dike mijar reng û xêz di formên xwe yên estetîk de xwe digihînin heta bi vebêjeyên wêjeya devkî ya Kurd.

**Temayên sereke yên resmên Zoro Mettînî**

Resamên Kurd ên xwe spartine wêjeya devkî ya Kurd ne ev kes tenê ne. Zoro Mettînî yê li Suriyê jidayikbûyî ji ber pirsgirêkên siyasî sala 1964'an bi malbata xwe re koçî Libnanê kir. Û li Beyrûtê akademiya huner qedand. Di sala 1972'yan de di pêşbirka Akedemiya Huner a Emerîkayê de xelata duyemîntiyê wergirt ku bi sedan hunermend tevlî bûbûn. Piştre dîrektoriya kovarên hunerî yen naskirî kir û li zaningehan ders dan. Ew tenê ne resam e, her wiha grafiker e jî. Li ser grafîkê di sala 1975'an de li ajansa reklaman Werbeagentur World xebitî û weke aktîvîst pêşengiya tevgerên hunerî kir. Di sala 1976'an de koçî Berlînê dike. Piştî hingî hêjayî gelek xelatên wêjeyî tê dîtin. Niha li Berlînê di akademiyên huner de li ser resm û grafîkê dersan dide.

Temayên sereke yên resmên Zoro Mettînî vebêjeyên wêjeya devkî û tradîsyonel e. Ew ji derfetên hunerê resma modern sûdê werdigire û mijarên wekî azadiya jinê tinetî, rastgobûn, bawerî û çînên civakî bi şêweyê xwe diresimîne.

Mirov dikare bibêje ku li Başûrê Kurdistanê jî çanda devkî tesîr li hunerê resmê kiriye û pê re, hunerê resmê qaîdeyên xwe yên estetîk ava kirine. Her çendî dîroka wê ji mêj ve be jî, li herêmê ekola resmê bi komekê dest pê dike ku serkêşiya wê Kurdê Cihû Daniel Qasab e. Tevgera resmê bi 1930'î li Hewlêrê kad dide û hîn di salên 1950'î de li Silêmanî û Dihokê bi pêş dikeve. Weke dewama vê jî di salên 1970'yî de resmê atmosfera xwe çêkir. Piştî destkeftiyên li dijî rejîma Iraqê û bi ketina Sedam Huseyin re di sala 1991'ê de bi avakirina parlamenê re hunerê resmê yê Kurdan jî di bin banê desteya çandê de bi pêş ket û bi hêz bû. Reşam Evdilmitalib Gerdî û Dr. Soran Simaîl jî ji wan kesan in ku bi vê ekolê re tevlî ekola resma Kurdan bûne. Hêza xwedî roleke mezin di berhemên van herdu resaman de li ser fîgura xwezayê dirûv digire. Bi taybetmendiyên rojhilatî yên karakterîstîk fîgur, xeml, sawêr, reng û hwd. mîna kodên jiyana çandî dewsên xwe li ser xebatên resmê hiştine.




Zehra Dogan bi mijarên bi temaya jinê neqişandî, bi mijarên bi jiyanê re têkildar, dide pey pirsên lêgerîna heqîqeta hunerê gerdûnî û hunerê Kurdan û bi awayekî taybet bersivan dide.







# Hestên xwe bi gewde dike



Nesrîn Îbrahîm Ehmo

Ez bi rengekî tenê kar nakim. Dema moralê min nabaş be, yan jî ez xemgîn bim, rengên germ yên weke sor, reş û porteqalî bi kar tînim. Lê dema moralê min xweş be ez rengê şîn tercîh dikim. Reng gelek tesîrê li ser berhemên min dike. Gelek caran reng psîkolojiya min diyar dike.

**Aysel AVESTA**

Nesrîn Îbrahîm Ehmo ji Rojavayê Kurdistanê ji Bajarê Hesekê ye. Wê li Sûriyê li zanîngehê bêşa mode dîzaynê xwend. Piştî ku wê xwendina xwe diqedîne jî di heman bêşê de dest bi kar dike. Gava ku şerê navxweyî destpê dike, ji Şamê diçe Libnanê. Li wir ji bo debara xwe dirûn kir û di heman demê de şêwekariya li ser tabloyan dewam kir.

Axirî, ew ji ber nebaşiya siheta xwe, neçar dibe, berê xwe bide Elmanyayê û niha li bajarê Hannoverê xwendina xwe ya pîşeyî dewam dike: Ew li dibistana bilind, li ser bêşa resm, model, komedî, anîmasyon û kompûterê dixwîne. Tevî ku zimanê Elmanî jê re zehmetiyan çêke jî, ew bi biryar e ku di bêşa xwe de bi ser keve. Weke şêwekareke ciwan, ew ji me re behsa têkiliya xwe bi resmê re dike û em jî li vir cih didin gotinên wê û tabloyên wê.

## Resm nasnameya min û gelê min e

"Ji destpêkê ve xêzkirina tablo û wêneyan gelekî bala min dikişand. Bi taybetî piştî ez hatim Ewrûpayê min xwest ez çîrok, serpêhatî û çanda gelê xwe bi riya hunerê xwe pêşkêşî nifşê nû bikim. Lewma min xwest ez bi zimanekî pêkenokî bala zarokan bikşînim ser çand û jiyana gelê xwe.

Resim ji bo min her tişt e. Ew nasnameya min e, nasnameya gelê min e. Sermeselê, cihê ku ez lê dixebitim, hemû Elman in. Dema ez tobloyekê çêdikim, bi wê tabloyê ez çand û nansameya gelê xwe jî didim nasandin. Niha ez bi komediyê dixwazim hunerê xwe pêşkêş bikim. Halê hazir, li ser Kawayê Hemdem û wateya cejna Newrozê projeyekê amade dikim. Bi vê projeyê ez dixwazim çanda berxwedêr a gelê Kurd bidim nasandin.

## Her reng bi maneyekê

Herçî karê min ê hunerî û têkiliya wî bi rengan re ye, ji karê min re gelek cûreyê rengan lazim dibin. Ji ber vê, ez di karê xwe de gelek rengên cuda bi kar tînim, lê rengê ez gelekî jê hez dikim rengê şîn e. Rengê şîn ji bo min tê wateya aramiyê. Helbet, her reng ji bo min xwedî wateyeke cuda ye. Ez bi rengekî tenê kar nakim. Dema moralê min nabaş be, yan jî ez xemgîn bim, rengên germ yên weke sor, reş û porteqalî bi kar tînim. Lê dema moralê min xweş be ez rengê şîn tercîh dikim. Reng gelek tesîrê li ser berhemên min dike. Gelek caran reng psîkolojiya min diyar dike.

## Hisên xwe xêz dikim

Ez di nava hezar tabloyan de li tabloya ku ez xeyal dikim, digerim. Heta ez bigihîjim hedefa xwe, gerîna min a li wê her wê dewam bike. Di tabloyên min de hestên min li pêş in. Lê di asoya min de jina Kurd û Kurdistanê hene. Ji sedî not, mijarên tobloyên min jiyana jinên Kurd e. Min li bajarê Elmanya Bielefeldê li ser jinên Êzîdî yên DAIŞ'ê ew dîl girtî, pêşangeheke wêneyan vekir. Ve pêşangehê gelek bandor li min kir. Her wiha li bajarê Hannoverê jî min li ser berxwedana jinan ya 8'ê Adarê roja jinên kedkar a cîhanê pêşengegek vekir. Armanca min bi van pêşangehan ew bû ku ez karibim bi reng û firça xwe bibim parçeyek ji têkoşîna jinan.

## Lêgerîna stîlê dewam dike

Di warê sitîla şêwekariyê de ez hîna li wê stîlê digerim ku wê li min bê. Min gelek şêwe çeribandin lê hîna min biryareke eseh nedaye. Ez dixwazim bi rêya tabloyekê, çîrok ango serpêhatiyekê xêz bikim û pêşkêş bikim.

## Pêşangeh ji bo darîçavkirinê

Min gelek berhem tomarkirine. Ez difikirim ku devera herî zêde dikarim berhemên xwe bidim xuyakirin, pêşangeha wêneyan e. Min heta niha li gelek navendên Elmanya, Fransa, Lubnan û Sûrî pêşangeh vekirin. 18'ê Mijdarê (Yekşema bihurî) li bajarê Bremenê festîvalekê dest pê kir, ez jî bi hunerê xwe beşdarî pêşangeha wêneyan ya li festîvalê dibim.

Axir, ez hewl didim bi hunerê xwe çand, dîrok û trajediya gelê xwe bînim ziman. Bi beşdariya pêşangehan armanca min ew e ku çanda gele xwe ya hezarên salan bidim nasandin û hinekî bibim dengê jinên Kurd.

Bi tabloyên xwe ez dikarim ya dilê xwe xêz bikim. Ez dikarim bi rengê xwe, bi firça xwe bibim dengê gelê xwe. Li gorî min divê şêwekar bi firça xwe, şanoger bi şanoya xwe û dengbêj bi dengê xwe bibin parçeyek ji têkoşîna azadîxwaz a gelê xwe."

> Bi tabloyên xwe ez dikarim ya dilê xwe xêz bikim. Ez dikarim bi rengê xwe, bi firça xwe bibim dengê gelê xwe. Li gorî min divê şêwekar bi firça xwe, şanoger bi şanoya xwe û dengbêj bi dengê xwe bibin parçeyek ji têkoşîna azadîxwaz a gelê xwe.



www.arsivakurd.org


Zuhêr Hesîb


Îhsan Hemo



Şukran Bilal


Beşar Îsa

# Çend dîmenên şêwekarî Ji Rojavayê Kurdistanê

Dirêî, kesekî zîrek û xwedan nihêrîn bû, ji ber wê, wî bandoreke mezin li nifşê xortên li pey xwe hişt û rêya hunerî hesan û şîrîn kir.


Xedica Bekir


Luqman EHMED

Helbestkarê Fransî, Charles Bodler, wisa huner dide nasîn ku ew *"sihirbaziyek bê nîşandek e, di nava xwe de, bi yek car form û mijar, cihana hunermend ya derve û hunermend bi xwe, tevahiya şênberî û razberiyê bi hev re dicivîne".*

Heger em lêvegerîneкê di nav rûpelên dîrokê de bikin, em ê bibînin ku huner kevintrîn şêwe ye ku mirovan xwe pê daye nasîn û xwe pê îfade kiriye. Li ser van gotinan mirov digihîje wê encamê ku ev sawêr û ramanên mirovantiyê di nav lepê huner de bi hemû şaxên xwe, bersiva hebûna têgihiştina mirov tîne ziman, ji nav tariya şikeftan ta galeriyên modern. Huner belgenameyeke seretayî ye di dîroka cihanê de.



### Hunerê nûjen û hişmendiya Kurdî li Rojavayê Kurdistanê

Dîroka hunerê nû û ramanên nûjenî li Rojavayê Kurdistanê nû ne, ew bi giştî girêdayî şert û mercên bûyerên Rojhilata Navîn bû ji her alî ve, û bi taybetî jî bi rewşa welatê Sûriyê ya siyasî ve, ji ber wê jî civata Kurdî li Sûriyê bi derengî guh da bi ziman û çanda xwe, û çave xwe li beşên din ên hunerî vekir.

Bi alozî çanda nûjen û hunerê şêwekariyê dest pê kir, li ser destê xortên ronakbîr û zîrek yên ku noteyên seretayî ji raperîna çanda Kurdî re nivîsandin û bi pêla lehiya guhertina wê serdemê re diçûn.

Ew çend kesên zîrek û têgihiştî, ku di bin bandora ramanên pêşveçûyî û bayê guhertinê de, huner û çand di dest wan de wek alavên şoreşgerî bûn, Mîr Celadet Bedirxan û raperîna ziman û rojnamegeriyê, û Xoybûn û ramanên welatperweriyê ji alîkî ve û ji aliyê din ve rewşa Sûrî bi giştî û berxwedana guhertinê di hemû beşên wê yê siyasî, civakî û çandî de.

### Nifşê yekem (1950 – 1965)

Di bin bandora rewşa Sûriya nû de, piştî serxwebûna wê ji Fransa, pêleke nû ji gêncên Sûrî dest bi xebatên hunerî û zanistî kir, li aliyekî ramanên komunîstî û li aliyê din çanda xiristiyanî ya kevin li Sûriyê. Gêncên Kurdan ji ketin bin vê bandorê, li Cizîrê, Ebdulrehman Direî û Xelef Ibrahîm Elhuseynî çalakiyên hunerî gûrr kirin û li nav şagirtan û xortên nûhatî ramanên xwe belav dikirin û li dibisitanan û navendên çandî pêşangeh û çalakî li dar xistin. Bi ser wilo de, Dirêî, keseki zîrek û xwedan nihêrîn bû, ji ber wê, wî bandoreke mezin li nifşê xortên li pey xwe hişt û rêya hunerî hesan û şîrîn kir, karê Xelef û Dirêî weke teknîk û şêweyê zanistî, ne pirr serketî bû, û mijarên realistik bi şêweyekî sivik bi kar anîn. Li aliyekî din li Efrînê, Ezîz Kedro û Henîfa Suleyman dest bi hunerê şêwekariyê kiribûn û bi berhemên xwe beşdarî çalakiyên Ereban dibûn.

### Nifşê duyem (1965 -1980)

Hunermendên nifşê duyem, bi nihêrîneke xwegirtî û bawerîn, eşkere hunerê şêwekariyê bi cih anîn, û di nav civata xwe de hatin naskirin, weke hunermend Omer Hesîb, Omer Hemdî (Malva), Beşar Îsa, Brahîm Heyderî, Lutfî Cefer, Behrem Haco û yên din; û yên li ser destê wan şêweya hunerê Kurdî xwe da nasîn û li nav holên hunerî cih girtin û bi giranî hate nirxandin, bi her tişta xwe taybet bû, ji aliyê mijarê xwe ve, teknîka xwe, û şêweyên bikaranîna kevalê ve, motîvên Kurdî bi her aliyê xwe ve di berhemên wan de xuya bûn, bi pirranî li ba Omer Hesîb û Beşar Îsa, û ev serboriya wan bû kevirê herî xurt di bingeha hunerê Kurdî de li Sûriyê.

### Nifşê sêyemîn (1980–1995) yan jî destpêka qonaxa hunerê akademîk


Hunermendên vî nifşî, berê xwe dan Zankoya Hunerê Bedew li Şama paytext, û dest pê kirin ku bi nihêrîneke zanistî li hunerî binihêrîn, û peywendiyên hunerî û çandî bi rewşenbîrên Ereb re saz kirin; Zuhêr Hesîb, Mihemed E. Ebdo, Sîdo Reşo, Henîf Hemo, Mihemed Salih Musa, Beşar Berazî, Xelîl Ebdulqadir, Inayet Etar, Ihsan Hemo, Ebid Xizêm, Reşîd Hiso, Mîrê Hêka, Rehîmo, Zubêr Yûsif û yên din; bi wan huner êdî bû xwedî nirx û rêz jê re hat girtin.

Berhemên vî beşî di her aliyê xwe de, dewama şêweyê nifşê beriya xwe bûn, lê bi hindek guhertin di warê alavên şêwekariyê ve û bi karanîna sembolên Kurdî de, di reng û mijarên xwe de, û di nav çalakiyên Erebî de cihên girîng girtin û bala rexnevanan kişandin ser xwe, xwedan deng û rengekî cuda bûn û peywendiyên bi ber bi grûpên hunerî re damezrandin.

Destan û çîrokên Kurdî bûn stûna kevalên wan, û motîvên Kurdî hatin eşkerekirin li ser cawê sipî, û xemla jina Kurd bi hemû rengên xwe bû xala cudabûna şêweyên wan ji şêweyên din. Êdî hunermendê Kurd, bi zanebûnê berhemên xwe afirand û şêweyên cuda ji beşên hunerî bi kar anîn ji şêweya realîstê ta ya


Xelil Ebdulqadir


Zubêr Yûsif


Ebdulrehman Dirêî

> Wan motîvên Kurdî êdî berê xwe da şêwaza abstraktê, bi rengên hindik û xêzên bilez amade dibû, û hinekî din bi şêweyekî îfadeya nû, berhemên xwe saz dikirin, li ser bingeha raman û kelepûra Kurdî, û folklorê.

abstraktê, û lêgerîna taybetiya xwe ji hemû aliyan ve birin serî; avahiya berheman (şêwekarî, peykertraşî) ket plana endezyarî û li ser wê form hatin dahûnandin, û reng bi harmonî li hev hatin hûnandin.


**Nifşê çaremîn û ta roja îro (ji 1995'an ve)**

Piştî ku êdî huner bû parçeyek ji çalakiyên Kurdî. Êdî civatê bi çavê cudabûnê li hunermend dinihêrî, û hunermend bû xwedî taybetmendiyekê di rola civatê de. Gelek hunermendên beşê sêyemîn bûn xwedî stîl û piştgiriya keç û xortên ciwan kirin, keç û xortên Kurd bi hêz hunerê xwe didan nasîn. Berhemên xwe bi astên bilind didan pêşandan û huner bû weke karekî rojane û bazirganiya wê hat kirin, ew berhemên şêwekariyê ta bi peykertaşiyê, gavên mezin avêtin di nav hunerê Sûrî û yê Erebî de, û mezintirîn xelat wergirtin, bi stîlên modern û cûreyên berfireh. Hin ji wan hunermendan Yûsif Beker, Xefor Hisên, Adil Dawod, Azad Hemê, Hejar Îsa, Guro, E.Kerîm Mejdel Bêk, Mûnîr Şêxê, Reşad Yûsif, Elî Elo, Ehmed Qilêj, Xecê Bekir, Xunav Salih, Mihmed Kutê, Salih Nemir, Ferzend Derwîş, Farûq Mihemed, Omer Yûsif, Hisko Hisko, Mehmûd Hiso, Luqman Ehmed, Jiyan Ebdulruhman, Ezîza Ehmed, Nîhad Turk, Leyla Turk, Şukran Bîlal, Xidir Ebdulkerîm, Wijdan Dêrikî, Semer Drêî, Idnan Ebdulrehman û yên din in. Bi wan, berhemên hunerî, êdî profesyonel bûn û ji kirasê klasîk derketin, ji mijara xwe ta bi teknîk û pîvana xwe, hindek ji van hunermendan alavên rojane bi kar anîn û berhemên xwe kirin meydana lêgerîn û lêkolînan, ji qûmê ta bi çewal û paçikan û hin tiştên din jî. Lê dîsanê, di wan firehiyên sipî de, sembolên Kurdî dibûn endamên serekî di afirandina hunerê wan de, ji dîwarê xaniyê heriyê ve û nîşanekên li ser wan, ta bi tiştên xwezaya Kurdistanê ve girêdayî. Vê girêdanê bala rexnevanan kişand ser xwe û bi nirxekî bilind berhemên wan nirxandin. Ev zengîniya di çavê Kurdî de mirovan matmayî dike, û ji hêleke din ve ew berhemên klasîk di bikaranîna alavan de man, lê bi mijara xwe taybet bû û bi avakirina endamên hunerî di nava berhemên xwe de, êdî nihêrîna li kevalê guhertin û hiştin ku endamên berhemên wan bi serbestî di hundirê çerçoveyekê de cî bigire, û reng jî wisa bi xwezayiya xwe dihat bikaranîn. Wan motîvên Kurdî êdî berê xwe da şêwaza abstraktê, bi rengên hindik û xêzên bilez amade dibû, û hinekî din bi şêweyekî îfadeya nû, berhemên xwe saz dikirin, li ser bingeha raman û kelepûra Kurdî, û folklorê.

**Li şûna encamê**

Di van çend têbîniyan de, xuyanî dibe ku Kurdên





Omer Hemdî (Malva)

Sûriyê xwedan ked û berhemên ciwaniyê ne di avakirina çandeke Kurdî li ser prensîpên zanistî û bedewiyê. Zelal dibe bê çawa ku ev sawêr û xeyala Kurdî ma bi rewayî û ji çavkaniyên xwe qut nebû, tevî ku civata Kurdî di bin barê paşveçûnê de melisiye, û pûç bûye, lê wek surrealîst dibêjin, ku sawêr û xeyal lehiya pêşveçûnê ye, civata Sûriyê bi giştî û saziyên fermî bi taybetî tinebûna Kurdan bi her hawî dike, lê hunermend û xwendekarên Kurd roj bi roj cihên taybet û bilind di nav rewşa welatê Sûriyê de digirin. Hunermendên herî navdar û jîr û çalak, ew bi xwe hunermendên Kurd in. Û her ew nasnameya hebûna xwe ne bi ked û berhemên ku miletê Kurd yek ji bingehên serekî ye li Sûriyê weke hevparê çand, ax û bayê wê ne.


Tabloyeke Zuhêr Hesîb

# Wêne û wênesaziya Bakur



FEWZÎ BÎLGE

Piştî salên 90'î bipêşketin û destketiyên civakî û siyasî di nava civaka Kurd de veguhezî hêviyeke mezin. Teyîsînek ji vê hêviyê jî bipêşketina huner bû. Bipêşketina huner û hunermendan zemînek ji çandê re jî çêdikir. Tevgerên siyasî yên Kurd weke her dewlet, rêxistin û saziyên cihanê, ev weke fersendekê bi kar anîn û xwestin huner û hunermendan têxin bin kontrola xwe û gelek ji wan xistine jî. Ew kontrolkirin, her çiqasî li gor min ne rast bû jî, hema hema hemû hunermendan, ji ber hêl û hestên xwe yên neteweyî, xwe bi destên wan ve berdan. Piştî vê rewşê, ew hêz, êdî bi tumerî ket destê hêzên tevgerên siyasî û hunermendan êdî nikarîbû xwe ji bin siya siyasiyan rizgar bikiraya. Lê pênc salên dawî, êdî rewş hindik be jî guheriye. Rewş çi dibe bila bibe, ti hêz divê hewl nede ku huner têxe binê kontrola xwe; lê kirin û hîn jî di nava wê hewldanê de ne. Her çi qasî di destpêkê de ev rewş weke serketinekê xuya bibe û gavên baş hatibin avêtin jî di rastiya jiyanê de ew binketinek, wendakirinek bû, ji ber ku hunerê ku hesab xwe bera navê bide, ruh jê dikişê.

### Li ser bingeheke ajîtasyon û propagandayê bûn

Piştî salên 90'î, hêzên siyasî, hemû hunermendên welatparêz di saziyan de civandin. Ne tenê şêwekar, hemû kesên bi beşên huner yên din dilebikin jî. Vê rewşê kir ku hunermend ji huner, ji afirandina hunerî bêtir, bi hevdu re bilebikin. Pirsgirêkên her hunermendî, derûniya her hunermendî, xebatên wan ên teorîk-pratîk cuda bûn û vê rewşê kir ku êdî neafirînin, nikaribin biafirînin an jî berhemên ji asta xwe kêmtir, hejartir biafirînin. Berhemên ku dihatin afirandin jî, ji ber sedema ku siyasiyan ew bi rê ve dibir, hema hema pirraniya wan li ser bingeheke ajîtasyon û propagandayê bûn.

Ev rewş di wê demê de li hesabê siyasiyan dihat belkî, lê bi qasî ku hewce bû, ew huner û hunermend civakî nedibûn. Civaka Kurd mîna her dem bi giştî berê xwe, bala xwe, ji çand û hunerê serdestên xwe neda alî û berê xwe neda huner û hunermendên xwe.

Ji bo vê rewşê, ne hewce ye mirov sond bixwe, jixwe mirov, li asîmîlasyon û otoasîmîlasyona civaka Kurd ku hîna jî bi bayê bezê têk dibe, binihêre bes e. Piştî demekê gelek hunermendan, rewşa sazî û dezgehan dît û hinek ji wan jê dûr ketin. Her wiha berdêlên pirr giran dan, gelek ji wan hîn jî wê êşê dikişînin.

Hunermendên ku newêribûn xwe bispêrin xwe, di saziyan de man, lê wan jî ji huner bêtir bi kesên kurtêlxur, mîna qijnikan ku weke hunermend tevdigeriyan û karê wan tenê li hemberî kesên diafirandin bû, ango karê wan tenê xerakirin bû. Bi vê rêgezê hevdu hejar kirin. Lê ev rasti jî heye ku, bi saya hêza siyasî, hunermendan êdî -bi hêsanî nebe jî- qet tine be di destpêkê de dikarîbû hestên xwe bi awayekî eşkere bianiyana zimên, di berhemên xwe de, qala Kurd û Kurdistanê bikirana. Îca heger em van bidin aliyekî û qala bipêşketina beşa wêne û wênesaziyê bikin; dikarim bibêjim ku beşa wêne di nava beşên huner yên din de her dem ya jinbavê bû. Tiştên ku ji bo beşên din dihatin kirin jî ti carî ji bo wêne û şêwekariyê nehat kirin. Jixwe, wêne ne tenê di civaka me de, li hemû cihanê, beşa ku herî hindik mirov pê re têkildar dibin; lê ya herî bi bandor e. De îcar civaka me û sedemên dîrokî yên weke; bêdewletbûn, bandora dîn a neerînî, şikandina diyalektîka neteweyê û pê ve girêdayî şer, talan, asîmîlasyon, koçberî, tinebûna dewlemendên neteweyî li aliyekî, di ser de jî rewşenbîrên Kurd jî tê de, gelek kes ji wênê direviyan, direvin.

### Berî salên 90' î û piştî salên 90' î

Mirov nikare heta salên 90' î qala hebûna şêwekariya Kurdan li Bakur bike. Ev teqez e ku berî 90'î jî gelek kesên Kurd ku bi wêne û şêwekariyê re lebikîne, hene. Lê mixabin ji wan yek jî bi nasnameya xwe, xwe nedaye qebûlkirin. Weke Tirkekî xebatên xwe domandine û wan jî ango serdestan jî ji ber ku li hesabê wan dihat, dest bi wan nedaye, lê ti kara wan jî negihaye civaka Kurd, hunerê Kurdan. Piştî salên 90'î geşbûna hêza siyasî û civakî kir ku gelek wênesaz biwêrin bi nasnameya xwe çalakiyên xwe li dar bixin û karibin bibêjin em; wênesaz Kurd in, ev wêneyên wênesazên Kurdan in, filan û bêvan.

Rastî, ev xaleke pirr girîng e. Şikandina tirsê ye û ji bo bindestekî, dikarim bibêjim tişta herî girîng e. Bi saya vê wêrekiyê, wênesazên Kurd dest bi xebatên xwe kirin û li her dera ku destê wan digihiştiyê, çalakiyên xwe (pêşangeh) li dar xistin û pê re peyamên xwe dan.



Tabloyeke Çidem Baran bi navê "Lerizînên Tenêtiyê"

Piştî salên 90'î, hêzên siyasî, hemû hunermendên welatparêz di saziyan de civandin. Ne tenê wênesaz, hemû kesên bi beşên huner yên din dilebikin jî. Vê rewşê kir ku hunermend ji hunerî, ji afirandina hunerî bêhtir, bi hev du re bilebikin.



www.arsivakurdi.org

Li Kurdistanê wênesazî pirr zehmet e; lê li gel wê jî ya girîng rewş çi dibe bila bibe, divê mirov evîndarê karê xwe, yanî wêne û wênesaziyê be. Wekî din ti guliya ku mirov xwe pê bigire tine ye.



*Dîmenek ji kargeha Soresor*

**Kîjan binavkirin rast e?**

Weke hejmar şêwekar ne pirr bûn. Pirrbûn ne pirr girîng e, lê bi qasî dengê xwe li gel hemû pirsgirêkan berz bikin; xebitîn, afirandin- li ber xwe dan û xwe heyî kirin. Şikandina tirsê bû sedemeke girîng a xwe heyîkirina wan.

Qet tine be, bîst sîh salên dawî li lîteratura hunerê Kurdan, di hişê wan de çend têgeh zêde kirin; weke wênesazên Kurd, wêne, pêşangeh, wêneyên Kurdan, peyker, peykertraşî, peykertraşên Kurd û hwd. Her çi qasî hinek kes yan derdor ji ber nezaniya xwe dixwazin wan peyv û têgehên di civaka Kurd de bi cih bûne, biguherînin jî li gorî pirraniyê ew qels dimînin. Weke ku tê zanîn resm, ressam bi Erebî ye. Nîgar- nîgarkêşî bi Farisî ye, wêne- wênesazî bi Kurdî ye, bi Tirkî tine ye. Wan ji Ereban girtiye û hewce nake mirov a ku di zimên de cihê xwe girtiye îca bi zorê bike Farisî an Erebî. Meqseda kesên wiha çi ye nizanim, yan jî bêjim nizanim.

**Ez hîna jî tu dengî ji wan nabihîzim**

Derketina wêne û wênesaziya Kurdan a bi nasnameya xwe ez weke pîvan bigirim, dikarim qala salên 1990'î û vir ve bikim. Di 1990'î de ew jî ne li Kurdistanê li bajarê Stenbolê çend wênesazên Kurd, me xwe gihand hevdu û bi niyeta em ji hevdu hêzê bigirin me dixwest kargeheke huner vekin lê mixabin me nikarîbû û me xebatên xwe - bêhtir civînên xwe - li komele û sendîkayên wê demê çêdikirin.

Me navê Koma Wênesazên Arya li xwe kir. Di demeke kurt de me bi navê Helepce, li Stenbolê pêşangeheke hevbeş li dar xist.

Di sala 1991'ê de Navenda Çanda Mezopotamya vebû û ji komê tenê çar heb wênesazan xebatên xwe li wir domandin. Yên din, wan nexwest ew werin. Ji me qetiyan, piştre deng ji wan biliya û ez hîn jî ti dengî ji wan nabihîzim. Me êdî weke Koma Wênesazê Mezopotamyayê xwe bi nav kir û di nava çend salan de hem li metropolan û hem jî li welêt gelek pêşangeh li dar xistin. Piştî wê, ew hevalên –wênesazên din- hinekan ji wan berê xwe da memûrtiyê û hinekan jî da siyasetê, ji wê komê ez bi tenê mam. Lê bi eks, bi girr min xebatên xwe dewam kirin.

**Temenê wênesaziya Kurdan kurt e**

Piştî salên 2000' î min berê xwe da welêt, li Batmanê bi cih bûm û min 15 salan li atolyeya xwe Soresorê perwedehiya wêne da. Min dixwest tevgereke hunerî ava bikim. Di wê tevgerê de gelek wênesaz nêzî sih kesên neqane bi ser ketin. Wan jî dest bi xebatên xwe kir lê mixabin ji ber şert û mercên zor, gelek heban dev jê berda. Ji loma dibêjim; temenê wênesaziya Kurdan kurt e.

Civak ne fêrî vê beşa huner e. Întelektuelên me jî ji vê beşê direvin. Muze, muzeyade, galerî, kargeh, rexnegirên huner, koleksiyoner tinene yan jî pirr û pirr kêm in. Wênesazên heyî piştî demekê nikarîbûn li ser lingên xwe bimînin û karibin jiyana xwe weke wênesazan bidomînin. Ji ber ku wênesaziyê ne di hêla maddî ne jî di hêla manewî de ew têr nedikirin. Di nava wan bîst, sîh salan de yeko yeko dev jê berdan û dest bi karên din yên ji rêzê kirin.

Di wê pêvajoyê de wênesazên ji derveyî sazî û dezgehan jî ji ber heman sedeman gelekan ji wan dev ji vî hunerî berda. An jî haya min ji wan tine ye, ew jî mumkin e. Li Bakur ev rastiyek e. Wênesazek an bi giştî hunermendek xwe red bike û xwe bispêre hêzên serdestan dikare li ser lingan bimîne û dimîne. Mînakên wiha pirr in û ne hêja ne ku navê wan hildim.

**Pirr an hindik diafirînin**

Wênesazên di kargeha Soresorê de (Kargeha Hunerê Bedew) gihiştibûn, hejmar û xebatên wan her çi qasî roj bi roj kêm bibin jî –ku gelek sedemên vê rewşê hene- hin kesên mîna Çidem Baran (nivîskar û wênesaz), Ehmed Ronîar (Nivîskar û wênesaz), Berçema Muşrîtan (Wênesaz û helbestkar), Zozan Bigçe, Jovan Horî li ber xwe didin. Pirr an hindik diafirînin.

Ji bilî van Şexmûz Kîno, M. Salih Korhan, Rêdî Saît Toprak, Serdar Bapîr, Zahir Kayan, Şehabettîn Nebîoğlu û Welat xebatên xwe didomînin. Li parçeyên din rewşa hunerê şêwekarî çawa ye mijareke din e lê li Bakur heger hunermendek ne bi hişmendiya Kurd û Kurdistanîbûnê tevbigere, di nava pêvajoyê de bi hêsanî vediguheze berovajiyê xwe û hejmara wan kesên wiha îro jî ne kêm e.

Şer bi awayekî biqede, meseleya neteweyî çareser bibe, gelek kes êdî wê bêhtir berê xwe bidin huner, wê bêhtir wênesaziyê bişopînin, nas bikin, binirxînin, hez bikin û biparêzin.

**Divê mirov evîndarê karê xwe be**

Li Kurdistanê wênesazî pirr zehmet e; lê li gel wê jî ya girîng rewş çi dibe bila bibe, divê mirov evîndarê karê xwe, yanî wêne û wênesaziyê be. Wekî din ti guliya ku mirov xwe pê bigire tine ye.

Bawer dikim, heger îro, qala hebûna wêne û wênesaziya Kurdan dibe, bi saya bipêşketinên piştî 1990'î û kesên wiha ne ku evîndarên welatê xwe û hunerê ne. Tenê evîndarên herduyan.

Li civaka me, hîn jî bela ku meseleya mayîn û nemayînê çareser nebûye, çavên civakê li siyasiyan e ku wê pirsgirêka giran çareser bikin. Hêz di destên wan de civiyaye û ew jî rola huner û hunermendan biçûk dibînin. Ji ber vê sedemê ye ku li aliyekî êrişên serdestan li aliyê din jî nihêrînên siyasiyan kiriye ku hunermend ne xwedî helwêst û rûmetekê bin. Ji ber van sedeman, emrê wênesaziya Bakur kurt e, lê ev rewş hêdî hêdî diguhere. Divê biguhere.

**Bi rêxistinkirina wênesazan ne hewce ye?**

Berî her tiştî xwestina bi rêxistinkirina wênesazan ne mumkin e û ne hewce ye. Ji wan hewldanên sih salî jî diyar dibe ku nebû û wê nebe û hewce jî nake. Ji ber ku; huner afirandineke tekaser e. Her hunermend di pêvajoya afirandinê de bi tenê ye. Şert û merc çi dibin jî bi tena serê xwe diafirîne. Hevkarî, hevbeşî mumkin e û wê bibe jî, dîsa her hunermend bi serê xwe û xwedî kesayet, derûnî û cihaneke cuda ye.

Wênesazî hevkariyê, hevbeşiyê napejirîne. Gelek bizav çêbûne. Gelek wênesazan bi hev re kargeh damezirandine, lê kesî doza rêxistinekê nekiriye. Tenê ji ber sedemên aborî hatine ba hev û gava keys lê anîne, ji hev dûr ketine.

Lênihêrîna huner jî li gorî bipêşketin û guherînên jiyanê diguhere. Mîna berê wênesaz xwe bi bizavekê nagirin û bizav jî êdî bi sedsalan hukma xwe nake. Bizav qediyane û hunermend li wan bizavan tenê tiştekî zêde dikin. Heger karibe, li gorî hêza xwe, tiştekî li yên heyî zêde bike, hingê bi ser dikeve.

Asta wênesaziya Bakur, li gel hemû pirsgirêkên giran, ku diyalektîka civakê –neteweyê- hatiye şikandin û nehiştine bizavên ku li cihanê jiyane, ew jî bijîn û biafirînin û bibin xwedî rabirdûyeke bizav û şêweyan. Civak hîna jî ne amade be, hunerê şêwekariyê yê Kurdan di asta hunerê cîhanê de ye, ji wan ne kêm e û ne jî zêde ye.

**Kargeha Hunerên Bedew Soresorê**

Şer bi awayekî biqede, meseleya neteweyî çareser bibe, gelek kes êdî wê bêhtir berê xwe bidin huner, wê bêhtir wênesaziyê bişopînin, nas bikin, binirxînin, hez bikin û biparêzin. Li gel hemû pirsgirêkên giran jî heger em bidin ber yên cihanê ku yên a niha heyî dikarim bibêjim ku di demeke ew qas kurt de bi ber pêşketinê ve gavên baş avêtine. Hem xwedî nirxên neteweyî, hem jî xwedî nirxên navneteweyî ne. Hemû bizav û şêweyên ku îro hene çi qasî diteyîsin berhemên wênesazên cihanê, ewqasî diteyisin berhemên wênesazên Kurd jî.

Heger mirov zorê bidiyê û behsa ekolan bike, tenê dikare bibêje; di nava 20-30 salên dawî de li Batmanê peyandineke tevgereke hunerî çêbûye. Li derdora Kargeha Hunerên Bedew Soresorê, qederê 30 wênesazî bi hev re 15-20 salan xebitîne, çalakî li dar xistine.

Ji bilî vê peyandina tevgera huner, mirov nikare qala ti yeke din û ekolan bike. Rewş wiha be jî di asta berheman de yên li derdora Kargeha hunerên Bedew Sorsorê û yên li derveyî wê xebitîne, ne di ser hev re ne.



www.arsivakurd.org

# Amy Lowell, yek ji dîyarkerên *Îmajîzmê* *

KEWA BERBANGÊ



Kawa NEMIR

Helbestkara Emerîkan. Li herêma New Englandê wekî keça malbateke dewlemend ji dayîk bû. Binemala Lowellan bi xêra hêza xwe ya civakî û aborîyî rewşa herêma xwe serdanpê guherand, gelek veberhênanên aborîyî û karên xêrxwazîyê kirin. Her wiha, hemû mêrên Lowellan xwendina xwe di Zankoya Harvardê de kuta kirin, jinên wan ji vê delîveyê bê par mane wê hingê.

Amy Lowell di 9'ê Reşemeya 1874'an de li Brooklinea Massachusettsê ji dayik bû. Bi tenê di navbera deh û hevdeh salîya xwe de çû dibistanê. Pirtûkxaneya malbata wê zehf fireh bû, wê bi xwe xwe perwerde kir, her wiha ji yaneya pirtûkan a bi navê *Boston Athenaeum* gelekî sûd wergirt. Wê hê di zarokatîya xwe de ji nivîsînê hez dikir, lê nivîskarîya wê ya bi pisporî, di 1912'an de, di sî û heşt salîya wê de dest pê kir. Wê salê, dîwana wê ya pêşîn, *A Dome of Many-Coloured Glass* (Qubeyeke Cama Pirr-reng) hate weşandin, vê dîwanê gelekî deng veda, rexneyên erênî wergirtin.

Kovara çandî û wêjeyî, *Poetryyê*, di 1912'an de dest bi weşanê kir. Ev kovareke biçûk bû, lê kartêkirinek anî mexderê ku kesî jê hêvî nedikir. *Bizava Îmajîst* ta radeyekê xwe di vir de nîşanî girseyan da, kovarê derîyê xwe ji gelek helbestkarên mezin re vekir, her wekî Eliot, Pound, Sandburg, Frost, D. H. Lawrence, H. D. (Hilda Doolittle), Richard Aldington û ê.d.. Wan çaxan, Amy Lowell çû Îngilistanê, dîtina Pound, H. D. û Aldington. Veguherana tund a helbesta Amy Lowellê, esas piştî ku wê helbestên H. D.'yê xwendin, rû da. Wê bi wî awayî *Îmajîzm* pejirand û pêşengîya *Îmajîzmê* ji destê Pound girt. Pound belaya xwe ji Amyyê venekir, bi tinazî got, êdî navê vê bizava hunerî *Amyîzm* e. Lê Amyyê hişkehişk bi kuja vê bizavê girt, du antolojiyên bi navê *Six French Poets* (Şeş Helbestkarên Fransiz, 1915) û *Tendencies in Modern American Poetry* (Mêlên Di Helbesta Emerîkan a Nûjen De, 1917) çap kirin da ku bingehên *Îmajîzmê* dîyar bike.

Dîwanên Amy Lowellê, *Sword Blades and Poppy Seed* (Devên Şûran û Tovê Pitpitokan, 1914), *Men, Women and Ghosts* (Mêrekan, Jinekan û Sawêrekan, 1916), *Can Grande's Castle* (Keleha Can Grande, 1918), *Pictures of the Floating World* (Sûretên Cîhaneke Li Ser Avê, 1919) û *Legends* (Efsanename, 1921), çu caran yekcar nebûne îmajîst, gelek helbestên dirêj î çîrokî û pexşanehelbestên rojnameyî bi xwe ve digirin. Li derine helbesta wê em çav bi şayîkîya zimanê Whitman û risteyên fesîh ên Carl Sandburg dikevin. Wê peyvsazîyeke sîmbolîk a kulîlkan û rengan wekî kereseya helbesta xwe bi kar anîye.

Di 12'ê Gulana 1925'an de, 51 salî bû, li bajarê wê yê jidayîkbûnê xwîn pekîya ser mêjîyê wê û wê jîyana xwe ji dest da û di Gorristana Mount Auburnê de hate veşartin.

** Nîşe: Ji bo ku zanyarîya der barê arşîva xebatên min ên wergerê de li vir tomar bibe, ji 1997'an heta niha min 140 helbestên Amy Lowellê ji Îngilîzî wergerandine Kurdîya Kurmancî û ev hê jî wekî pirtûk nehatine weşandin. (K. N.)*

**Pirtûka Keviran û Şilêran**

Ez pirtûkekê dixwînim,
Yeke navzêrîn,
Bi xwînê hatî nivîsîn
Li ser pelekî agirîn.
Û peyvên pirtûkê
Spîpoş kirî bûn,
Bi rengên pilingan,
Ew pê geş dibûn. Peyvên herîr strandin
Mîna koroyeke melekan,
Û baskên wan ên argon
Agir berdane esmanan. Paşê min li ser nivîn serî rakir,
Guh bi ser de kerr kir tim,
Û peyvan bi pûtepêdan strandin,
Ku min dikaribû bibihîzim. Şeva tarî vebû
Mîna zengilekî zîvîn,
Û min bihîst bê çi bû
Yeqîn peyv dibêjin:
"Biheşt pak e.
Nepakî Dojeh e." Şev hate girtin
Mîna zengilekî zîvîn.
Lê peyvan hîn jî strandin,
Û min pak guhdarî kir hîn. Min bihîst bayên daran
Melisîn û gurmijîn,
Min dîtin pêlên hêşîn
Li ser peraveke kevirîn. Min dîtin baskên şîn
Li nava perpitîna agirî.
Destên min zeft kirin pûrtên
Vîyanê gişî.
Ez girîyam bo çakûçan,
Bo destxeteke misê zer,
Belam germ bû gîyanê min
Her wekî şûşeya terr.
Paşê peyvên geşegeş,
Giş sertaser spîpoş,
Rawestîyan li nava çembera şeva zîvîn
Û strandin:
"Tehb û Sehb Şadîya Abadîn.
Tehb û Sehb yekane jîyan." Û kezîyên goştê min
bûne mîna bandoyan,
Û şûşeya gîyanê min hişk bû û teyisî
Ji hemû agiran, ez ketim pey ku bigihîjime xwegorrîkirinan
Li seranserê xunav û zêrînîya rojeke teze.

**Şi'êra Ku Hat Şandin Piştî Ku Min Bihîst Wekî Wang Ch'ang-ling Sergomî Lung Piaoyê Kirine**
*Nivîsî Li T'ai-po*

Li Yang Chouyê, kulîlkên daran diweşin. Şevhelû dixwîne.
Li min tesele dibe ew dibêje wekî tu diçî Lung Piaoyê – wekî tu yê derbas bibî di Pênc Robaran re.
Ez î kul û kesera dilê xwe kewkîyî heyva bi nûr û neder dikim
Wekî ew bikaribe, xût mîna bînayîya çavan, bide pey bê û xwe bigihîne Rojavayê Yeh Langê.

**Tava Geş**

Bayî kujeke şala te da ber xwe û hilda
Avête nava çavkanîyê,
Li kê derê ew dimilmile û di ro de diçe
Di nava pelên lûleperan ên li ser avê de
Mîna tevneke yaqûtên şîn.
Lê tu guh nadî wê,
Tilîyên te kaş û berkaş dikin kevzên
Li ser kevîya kevir a tejaneyê,
Pê re jî çavên te raçav dikin ewrên bilind
Gava ku ew dişêlihin di ser berûyên kesk re.

**Tenyatî**

Li binê kulîlkên şiloran sekinîne bilbil in;
Lê derya pena bûye li nava mijeke spîka hêkê,
Û xwe kerr kirine.

**Wêneyê Şeva Havînê**

Taveheyvê mişar kiriye baxçe,
Heta kevîyên xwe mişt e bi zîvê ku hildiçe,
Di ser re diçin, tarî dibin bêrmên masîyan,
Direvin bi çirayên biçûk ên şeytanî
yên ku vedimirin piştî kêlîyekê.
Belgên şilêran serav dibin, bedew mîna reşbûna
li ser zîvê lawaz î kevin,
Heyva Nandirûnê ji esmên de şor dibe giran giran,
Zebeşekî spî, balete lê ketî, dibiriqe bi gef û gurr, foqilede.
Pencereya te sorezer e li ber taveheyvê,
Geş dike mîna lempeyeke li paş şaxên erxewana pîr,
Dişuxule mîna lempeyeke li ber perestgehekê,
Perestgeha biçûk, xerîbdost, nas,
Ku bi rêzgirî danîne nava qeremîtan,
Ên dîwarê baxçeyekî ku pirr hez kirine jê.

**Ne Li Vir î**

Îşev badîna min vala ye,
Sar û têhnî ne lêvên wê,
Bayê ku di pencereya vekirî re tê wê diefsirîne.
Vala û bê xêr, çîk û çirûskên wê kiz li ber taveheyvê.
Jûr mişt e ji bêhna xweş a seyr
A kulîlkên gûşîdara erxewanî.
Ji xwe re vediweşin li ber tîşkweşênîya heyvê
Û nermenerm ditepînine dîwêr.
Lê badîna dilê min hêmin e,
Û sar e, û vala ye.
Gava ku tu têyî, badîna min qûçtijî dibe
Sor û lerza pê xwînê,
Xwîna dilî bo vexwarina te;
Da ku mişt bike devê te ji evînê
Û çêja no-şêrîn a gîyanekî.

**Tavsork**

Gulên heşî
Rengê gulfam ê seyr ê porsêlenên Çînê;
Newaze – geşîya wan a mîna tirafê.
Lê, Delala min, ew e hêzerana şînê spîçolkî ye
Ku dimilmile bayîyane berev dilê min.
Havînên din –
Û sîsirkek dike çîrreçîrr li nava çêreyê.

**Tavîyeke Baranê**

Ji wê devejengîya baranê, ya ku fîtikan li rêzên tanan dide
Û dike ku şahrê bikine fişefiş,
Ez çi qasî hez dikim ji wê!
Û pelandina te ya li ser milê min
Gava ku tu xwe şîşî min dikî da ku sîwana min
Bikaribe te vegire.
Çingînîya dilopan a li ser hevrîşimê vezelandî.
Nûrenûra şil a ku tê di nava gulîyên kesk re.

**Dagêrbûna ji Çîyayê Başûr ê Serhed; Çûyîna bo Xanîyê Hu Ssŭyê Hezkirê Gir û Gazan; Bihurandina Şevê bi Amadekirina Şerabê ve**
*Nivîsî Li T'ai-po*

Em xwe berdidin ji girê yeşîmî yê keskegewr,
Heyva çîyê hevrêtîyê li gel me dike heta malê.
Em dizivirin û li pey xwe, li serfêza şiverêyê dinihêrin:
Kesk, kesk, esman; tixûbê keskê masîgiran ê berwarî
yê gir û gazan vêdise û betave dibe.
Destên me di destên hev de, em digihîjine xanîyê li nava zevîyan.
Gedeyên çûçkanok hildidin vedikin derwazeyê
ji çiqlên daregivîjan,
Şiverêya bêdeng çivan dide xwe li nava bambûyên tarî,
Dargerînkên geş ji keskê teze xwe di cil û bergên me didin.
Gotin û qisedanên me şên in, kana hêsabûnê ne.
Çêjeke xwe ya xweşbêhn e berkemal heye, şerabê!
Em armûşkên
wê bi dilnîyayî dêris dikin.
Bo demeke dirêj em stranan distrên; em teraneperdaz wan distrên
bo bayê di nava darekajan de.
Pê re pê re stran diqedin, stêrkên di Robarê Biheştê de
dimînin çend heb.
Serî çîçkekî li min mest e. Hevalê min hema ketiye
ber bayê dinyayê.
Bi rastî, em wisa li tirazan dixin ku em her du jî ji bîr dikin
vê çerxa aloz, cîhanê.



www.arsivakurd.org

**Reşêle**
*"Ez nikarim derkevim,' got reşêleyî."*
*Rêwîtîya Hestyar a STERNE.*

Heta hetayê ew dîwarê mihesereya mandegar
Ê xwebûnê bo gîyanê min ê dexezar bendîxane ye,
Ez qet nabînim ewrên spî yên gewre bê çawa ye
Bikevine ber bayekî girdan, ku ne ji pencereya caxdar
A biçûk a zindana min be. Ez êxsîr im, bendewar,
Jîna min a derve tev de qulikeke çarçik e basko ye,
Lakêşe ye; di nava pirtikek kaxiza parşîmen de ye,
Veristî û pêçpêçî wek gulokek rîsê ristî pêçbar.
Agirê hizrên min vemirîye, reşbîn in tev de
Ji bela ku her tim ên min in, baskên sewdaserîya min
Weşîyane û pûrt û perik pîrepîreyî bûne.
Ez diçerçirim seba xwezîyên qet kifş nebûyî di hev de,
Seba bengînîyên xerîb, sêwrên ku seyr in
Wekî, ji rojekê re çi, bibime keseke ku bi tehrekî din e.

**Maladie de l'Après-Midi***
Çima çeqçeqa kaşkeyeke hespan a durêzînî
Ya di rê de
Wisa min posîde dike?
Deng dadiweşîne hewayê
Bi derbên yekaheng,
Diltengker û bênavbirrî.

Ne tava rojê ya çilka zêr jî,
Ya ku dixurice di nava pelên misîzer û kesk ên berûyan re,
Ne teşîya argon a dareserwîyekê
Ya mêwa japonî ya Virginiayê jê re bûyî kolos,
Ne jî şewq û şemala bixumînî ya hewayê,
Dikare sewsîtîya min dayne.

Kaşke hêdîka diçe,
Bi leza meşê dilive bê deng û his,
Pê re jî derbên yekaheng ên deng
Min diêşînin,
Pê re jî dikin ku ti namîne ez bigirîm bi hîskehîsk.

** (Bi Fransizî) Acizîya Piştî Nîvro. (nîşeya wergêr)*

**Baristanî**
Deryaçe polareng û qehweyîyê sor e,
Û partek ewrên dilguvêş zûka bi kufekuf dibeze di esmên re.

Çi qewî te hilbijart ku tu werî veşartin
Di vê gorristana biçûk e li ber qeraxa deryaçeyê de.
Beyanîyên şîn her tişt zehf xweş û geş e,
Beyanîyên Havînê,
Beyanîyên Payîzê yên kaw û kubar ji tavê.
Lê çaxa Zivistanê, di barroveyên sar de,
Dema ku piç ba tinebe,
Û berf dike xumînî çi qasî dibare!
Kêlegorr di nerma xwe de dibirûsin di hingorê de
Heçku hatibine perixandin bi fosforê.
Rêya rasteser berejorî girekî,
Di nava dehl û dirran re diçe –
Ez ê bidime ser rêya deryaçeyê,
Di wir re ez dikarim bileztir bajom.
Zemanekî te hez dikir bi min re bajoyî –
Bo çi mirin vî tiştê tirsnak bi te re çêdike?
Şîrq! – Qîrç! – simên hespê min li keviran diqelibin.
Hema li tanga çivangehê xanîyek heye.

**Siwarên Pîrê**
*Perava Deryaçeya Michiganê*

Siwarên pîrê kirine çîzeçîz li nava darên kiz,
Û min gote xwe qey ew qerqodeyên spî yên biçûk in
Ku tevî kemançeyê dijenînin bi cotek hestîyên tilîyan.

Cara dawîn kingê bû Çermesor li vir meşîyan,
Bi pêyên hilû teletel xîz çap kirin?
Cara dawîn kingê bû Çermesor li vir mirin
Û xîzên bixuşexuş hestî bi hestî ew rêş kirin bi xîjexîj?
Çermesorên mirî yên li binê xîzan, ku hestîyên xwe dijenînin
li ber tayên moridîravan.
Rehên darên terr, teze pê ketin gorrên wan kirin xirxirk,
Lê li nava gulîyan veniştine qerqodeyên biçûk
Ên ku bi kirrekirr binorîyeke dilşewat digerînin
di nava şeva Gelawêjê re.

**Berê Guvika Bayî Bi Başûr Ve ye**
Min girt pelên te hilandin,
Yeko yeko:
Pelên derekî yên fireh, req;
Ew ên biçûktir,
Çend xweş e mirov wan bipelîne, rehrehkî bi şivîyên xemrî;
Pelên hundir î vemiştî.
Yeko yeko
Min tu raqetandî ji pelên te
Ta ku tu rabûyî ser xwe mîna kulîlkeke spî
Ya ku nermika vediweşe li ber bayê êvarê.

Kulîlka spî,
Kulîlka ji şimayê, ji yeşîm, ji heqîqê bê reh û şivî;
Kulîlka rûxarên xwe qeşa,
Sîyên xwe hino hino argon.
Li kê dera tevayîya bêxçe heye kulîlkeke welê?
Stêrk li hev dibine perwar di nava pelên leylaqan re
Da ku li te temaşe bikin.
Heyva dagêrbûyî te dibiriqîne bi zîv.

Qeysa bişkojê di xarûfê re naçe.
Çu tişt nîne ku hinkûfê bişkojeke spî be,
Her bi çi rengî be, û her çi be,
Perdax kirî li ser destê taveheyvê,
Ne bi destê xwe li ber bayekî nermemilmilî.

**Rezber, 1918**
Ev piştînîvro rengê avê bû, a ku dadirijîya di nava
tavê re;
Dar diteyîsîn bi geremola pelan re;
Peyarêk dibiriqîn mîna bihurên pelên kevotan ên werandî,
Û xanîyan di wan re meydanek kir keneken di gorrepanê,
pencereyên vekirî re.
Li binê dareke li seyrangehê,
Du gedeyên çûçkanok, xwe xûz kiribûn û ser î di ber de,
Pê ketibûn semtika qerehubur berhev dikirin ji xwe re
Wekî tê kine qutîkeke karton.

Wê roj bê û koka şer biqele,
Paşê ez ê bigirim vê piştînîvroyê derxim
Û wê biqulibînim di nava tilîyên xwe de,
Û şirove bikim çêja wê ya xweş li ser esmanê devê xwe,
Û dereve bikim cureyê biqirpeqirp ê taxeyên wê yên pelan.
Îro ro ez bes dikarim wê berhev bikim
Û tê kime çenteyê xwe yê xurek,
Ji ber ku dema min tine ji ti tiştî re
Ji bilî ku ez xwînê ji xwe berdim da ku xwe hevseng bigirim
Li ser cîhaneke dêran.






www.arsivakurd.org

# Bîr, huner û çîrok

Bîrên me yên derûnî, fizîkî û civakî, hêmanên sereke ne ku birêveçûna jiyana me diyar dikin. Gava em jiyana xwe weke çîrokekê binirxînin, gelek caran ji destpêka çîrokê heta dawiya çîrokê, lêhûrbûna me li ser van hêmanan e bê ka di nav mejiyê me de li ku derê cih digire.



Serdar MUTLU

Di jiyanê de heyîniya me ya herî girîng "bîr" e. Ez qala wê hêzê dikim ku li her merhaleya jiyana me li ber serê me ye, bi awayekî din parçeyek ji laşê me ye. Hêzeke wisa ye ku her dem û mekana ku em tê de ne, dikare bar bike dem û mekaneke din. Wekî "gerdûneke mîkro" ye, ya ku hemû materyalên ji bo avakirina "gerdûna makro" di xwe de bihewîne.

Di kûrahiya bîrê de angaştin tine. Bîrên me yên derûnî, fizîkî û civakî, hêmanên sereke ne ku birêveçûna jiyana me diyar dikin. Gava em jiyana xwe weke çîrokekê binirxînin, gelek caran ji destpêka çîrokê heta dawiya çîrokê, lêhûrbûna me li ser van hêmanan e bê ka di nav mejiyê me de li ku derê cih digire. Wekî bibîranîna ku ji zarokatiyeke bi êş maye û di navbera me û siberojê de pir ava dike. Paşeroja me çîroka me dinivîsîne, jiyane me jî çîroka civakê.

**Dûrketina ji bîrê biyanîbûn e**

Çîroka me yan jî dîroka me ya ebedî li ser laşê me nivîsî ye. Mirov li ser xwe û li ser civakê dinivîsin; civat jî li ser mirovan dinivîse. Em dikarin çîroka xwe ji bedena xwe bi hêsanî bixwînin. Gaveke din bi pêş ve, rasterast an nerasterast, em dikarin çîrokên mirovên ku bi me re ketine têkiliyê jî ji bedena xwe bibînin. Çaxê em hemû tiştan kom dikin, em di têgeha çîrokê de kûr dibin. Bi awayekî din em tê digihîjin ku "dîrok di roja me de, em di destpêka çîrokê de sipartî ne". Berovajiyê vê dibe "biyanîbûn". Ji xwe biyanîbûn û ji civakê biyanîbûn. Çawa ku Marks gotiye, "hêzên hilberiyê yên ku li destekî kom dibin, biyanîbûn" be, ji dûrketina ji navenda bîrê jî, ji xwe û ji civakê biyanîbûn e.

**Çîroka ne ya hevpar**

Gelo bi bikaranîna huner em dikarin çîroka me ya hevpar derxine holê? Ya rastî; ev bi hezar salan e ku mirovahî, bi vegotina dîtbarî û derûnî ya huner, ya ku em pê dijîn, wê dibînin, his dikin û hîs dikin, bi kar tîne. Vegotina hunerbarî, bûye rêya herî vekirî û aloz ji bo vegotina danehevên bedenên me.

Hêza huner ji bo parastina bîra hevpar heye. Baweriya min jî ew e ku civak her çiqasî bîranînên xwe biparêze, ewqasî dibe "civaka demokratîk". Ez di xebatên xwe de hewl didim nîqaşên "bîr"ê parve bikim. Çîrokan berhev dikim û wan çîrokan dikime "çîroka hevbeş". Sermeselê, parvekirin, yek ji zagonên sereke ya mirovahiyê ye. Dema ku em û kesên din bi hev re malekê, gundekî, bajarekî, welatekî yan jî gerdûnekê parve dikin, em bi wan kesan re dikevine nava çîrokeke hevpar. Teknîk ne girîng e, şîrovekirin girîngtir e, dibe ku bibe peykerek, wêneyek an jî hunerê bicihkirinê (înstalasiyon). Bi şêweyekî hêsanî, dema ez portreya mirovekî diwênim, xêz dikim, çîrokên karakterên li derdora wî mirovî jî li ser bedena wî mirovî xêz dikim. Bi gelemperî bi vê vegotinê mirovên ku koç dikin (bi wateyeke din, mirovên ku dimeşin) bi cih dikim. Dibe ku ev penaber bi karakterên sereke re qet neketibine têkiliyê yan jî bi qasî ku min li çîrokên wan guhdar kiriye, mirovên ku min temasî wan kiriye. Li vê xalê armanca esasî pevgihandina çîrokên ku qet temasî hevûdin nekirine û parastina hemû bûyerên e ku li vê gerdûnê diqewimin, esas parçeyekî çîroka me ne.





www.arsivakurdi.org




# Penaberî zehmet e Penaberbûn hêsan

Performanseke me ya li pêşaneyeke min a li bajarê Bielê ê Swîsreyê, dikare bibe mînakeke zindî. Hevaleke min î Tirk ji bo gerê ji Tirkiyeyê hatibû Swîsre û rojekê ku em bi otostopê digeriyan, ji parezerê xwe bihîst ku ji ber ku li hemberî DAIŞ´î beşdarî civîneke qanûnî ya çapemeniyê bûye 10 sal cezayê girtîgehê lê hatiye birrîn. Weke tûrîstekê, ji bo gerê hatibû, lê êdî nedikarî vegere welatê xwe. Çimkî ji wê nişkê ve êdî ew jî bûbû penaberek. Belê, jiyana penaberî ne hêsan e, lê penaberbûyîn çiqas hêsan e!


Me jî berî pêşandana min performanseke spontane nivîsî. Hevala min di navbera awirên şaşwaz yên mêvanan de (35-40 kes), li ber resmên min ên derheqê çîrokên penaberan de xwe tazî kir û rûnişt. Dû re min jî hewl da ku li ser bedena wê, çîrokên penaberan binivîsim; ango li ser bedena penabereke nû, penabereke ku çîrokeke hevpar diparêze. Me bi vî awayî nedixwest, lê êdî çîroka min û wê û me û wan bûbû hevpar.

Peyama hereketa di nava resma min de ev e: "Em di heman çîrokê de dijîn"...









Dema ku em û kesên din bi hev re malekê, gundekî, bajarekî, welatekî yan jî gerdûnekê parve dikin, em bi wan kesan re dikevine nava çîrokeke hevpar. Teknîk ne girîng e, şîrovekirin girîngtir e, dibe ku bibe peykerek, wêneyek an jî hunerê bicihkirinê.

www.arsivakurd.org

Kes tune bû,
Binivîse pirtûka me.
Em bi tevahiya jiyana xwe,
Li benda destekî bûn,
Ku porên me miz de.
Di bin lihêfekê de
Deh pê û pênc serî.
Tiştê me germ dikir,
Xuşk û biratiya me.

Li benda çîrokekê man,
Di heman jiyana xwe de,
Kesî negot ji me re,
Em nebirin xewnên rengîn.

Tune bû kes,
Ku pirtûkê me binivîse.

(...)

Bêrî Bihar



FOTO: ANHA/ŞEHBA

www.pirtukakurdi.org